# Eşîret di sîstema dewlet û mîrgehên kurdî de Eşîra Pencînaran We Mînak

Zeynelabidin Zinar
Vekoler u Nivîskar. Stockholm/ Swêd

**Kurte**:

Diyar e ku 10-12 dewlet û gelek Mîrgehên Kurdistanê, ji aliyê gelek rewşenbîrên Kurd û biyanî ve, herweha ji aliyê saziyên zanistiyê ve jî rind hatine zanîn û gelek lêkolîn jî li ser wan hatine kirin.

Lê belê sîstema Eşîrên Kurdistanê heta niha nehatiye zanîn û daxwaza ku bête zanîn jî nehatiye kirin. Ji ber hindê desthekatiya eşîran sergirtî maye û jiyana wan/ serpêhatiya wan nebûye babetên lêkolînan.

1995-96 dema me lêkolîneke berfireh li ser Mîrektiya Zozanê Şerefdînê û piştre jî 2005-06 li ser Eşîra Pencînarê ku hatiye kirin, derket holê ku sîstema Eşîrên Kurdistanê jî herwekî sîstema dewlet û Mîrgehên Kurdistanê hatiye domandin.

Di serokatiya piraniya eşîrên Kurdistanê de, çendî ku serokek bi navê AXA hebûye jî, lêmecliseke eşîrê jî hebûye û ji her bavikekî eşîrê, yan ji her eşîreke ku girêdayê bi eşîra sereke ve bûye, nûnerekî wê di meclisa bala de hebûye. Di binê çavdêriya eşîrê de dadgeh, girtîgeh, sezayê sirgûnê jî hatiye bikaranîn, lê sezayê kuştinê nebûye.

Çûnku Eşîrên Kurdistanê, kultura xwe ji Mîrektiyên Kurdistanê wergitine,mîrektiyên Kurdistanê jî, kultura xwe ji Dewletên Kurdan wergirtine, Ji ber hindê pir girîng e ku Saziyên Zanistiya Kurdî, lêkolînine berfireh li ser desthelatiya Eşîrên Kurdistanê bikin. Yek ji wan eşîrên Kurdistanê ku wek sîstema dewletiyê dest helatiya xwe daye domandin jî, Eşîra Pencînarê ye ku di pirtûkeke lêkolîna me de bi rêkûpêk hatiye diyarkirin.

Ya duyem jî, deshelatiya Eşîrên Zozanê Şerefdînê ye ku ew jî ji aliyê me ve wek pirtûk hatiye weşandin. Ya sêyem jî, eşîrên Sasonê ne ku Osman Sebrî li ser wan nivîsiye.

Herweha piraniya eşîrên Kurdistanê bi wê sîstema dewletiyê jiyana xwe domandine. Di Sedsala 18-19an de, Eşîra Pencînarê, du caran şer bi Împeretoriya Osmanî re kiriye.

Di şerê pêşî de eşîr bindest ketiye, lê di şerê duyem de Osmanî bêgav mane û pê re peymana aştiyê çêkirine, hetanî 1924an jî leşkerên Osmanî (Komara Tirkiyê) nediketin nava herêma eşîrê ku sînorên nexşeya wê dema peymanê hatiye kifşkirin.

Deshelatiya Zozanê Şerefdînê di Sedsala 17an de bûye, ew jî xwedanê desthelatiyeke bi rûkûpêk bûye û wek sazûmana dewletbûnê jiyana xwe domandiye.

Bêguman diyar e ku hemû serhildanên Neteweyên Kurd ku di Sedsala 18-19 û nîvê 20 de ku çêbûne. Ew serhildan hemû, ji alyê Eşêrên Kurdistanê ve hatine lidarxistin. Ji ber hindê ye ku dewletên dagîrker, hertim axa û şêxên Kurdistanê xeniqandine.

**PEYVÊN SEREKE:** *Pencinar, Eşîrên Kurd, Sason, Hisi, Bişar, Cemil, Ehmed, Huseyn, Şerê Mêliha, Barbiro, Oster Om Eufrat.*

**1. NAVEROK:**

Diyar e ku împeretorî, dewlet û Mîrgehên Kurdan ên ku hebûne, bi eşîrên Kurdan ava bûne. Eşîr jî ji bavikan, bavik jî ji malbatan û malbat jî ji kesan ava pêkhatine. Heta niha pir kêm lêkolînên zanistî li ser Eşîrên Kurdistanê hatine kirin.

Ji ber hindê desthelatiya eşîran sergirtî maye û jiyana wan nebûye babetên lêkolînan zanistî.

1995-96 dema me lêkolîneke berfireh li ser Mîrektiya Zozanê Şerefdînê û piştre jî 2005-06 li ser Eşîra Pencînarê da kirin, derket holê ku sîstema Eşîrên Kurdistanê jî, herwekî sîstema dewlet û Mîrgehên Kurdistanê bûne.

Bêguman Eşîrên Kurdistanê kultura xwe ya îdarî, ji Mîrektiyên Kurdistanê wergitine.

Mîrektiyên Kurdistanê jî, kultura xwe ji Dewletên Kurdan wergirtine. Ji ber hindê pir girîng e ku Saziyên Zanistiya Kurdî lêkolînên berfireh li ser desthelatiya Eşîrên Kurdistanê bikin.

Di serokatiya piraniya eşîrên Kurdistanê de, çendî ku kesek bi navê AXA hebûye jî, lê mecliseke eşîrê jî hebûye. Ji her bavikekî eşîrê, yan ji her eşîreke ku girêdayê bi eşîra sereke ve bûye, nûnerekî wê di meclisa bala de hebûye û kincên li wan jî taybetî bûne da bêtin naskirin. Di binê çavdêriya eşîrê de dadgeh, girtîgeh, sezayê sirgûnê jî hebûne.

Yek ji wan eşîrên Kurdistanê ya bi vî rengî, Eşîra **Pencînarê** bûye ku di pirtûkeke lêkolîna me de bi rêkûpêk hatiye diyarkirin

**2. Cih û Warên Eşîra Pencînarê:**

Cihê ku niha Eşîra Pencînarê lê ye, Çiyayê Gûrdilan û Deşta Xerzan e. Ew herêma ku bi navê Deşta Xerzan hatiye binavkirin, behnava wê weha ye: Ji binê bajarê Hezo dest pê dike û berûber bi Çemê Xerzan re ber bi başûr ve dikişe, rast çûye di keviya herêma Reşkotan re dibihûre û li binê bajarê Qûbînê berê xwe daye Rojhilat û çûye di Ridwanê re derbas bûye, gihaye ser keviya Çemê Dîcle û Botanê. Ji wirê ber bi bakûr ve di qûntara çiyayê Reşan re çûye xwe gehandiye herêma Babosiyê û dîsa ber bi Rojava ve çûye gehaye binê bajarê Hezo keviya Çemê Xerzanê.

Çiyayê Gurdilan jî ji Rojhilata Deşta Xerzan dest pê dike û bajarê Misircê ji aliyê bakûr ve xistiye hemêza xwe, heta digîje ava Çemê Başûran û çem û çem ber bi başûr ve çûye, aqarê xwe gehandiye heta Bêtilê û keviya Ava Mezin ango devera ku ew çem hemû gehane ser hevûdû.

Li Deşta Xerzanê û li Çiyayê Gurdilan, gelek gundên şên û boş ên Eşîra Pencînarê hene û wek bajar tenê Misirc (Kurtalan) e ku wek navenda Pencînaran hatiye naskirin. Hin ji wan gundên eşîrê ev in: Eynik, Eynqesr, Eyndar, Hishis, Telîba, Darê, Başûra, Çayê, Baqird, Pîrişm, Bînof, Selind, Erenz, Darosil, Haf, Eynxela, Bîşêr, Tureş, Xirbepero, Bêtahm, Bastoqa, Marîb, Gozerdel, Batas, Kelemeran, Bîra Kirêdiya, Kuşana, Eyngerm, Hiler, Seles, Hemdûna, Kanîsork û hwd. Li gor hin çavkaniyan li dora 120î, gundên eşîrê hene. Hin ji van gûndan pirî xweş in, Gotinên Pêşiyan jî li ser wan hatine gotin, wek mînak: "Eynik û Eyndar, Bêkend û Minar, xweştir in ji textê xwendkar."

**3. Bavikên Eşîra Pencînarê:**

Li gora lêkolînan, heft bavikên Eşîra Pencînaran hene, lê çend bavikên biçûk jî hene, ew zêde nehatine naskirin. Çendî ku bavik xwe eşîreke tenê dihesibînin, lê Neteweyê Kurd her yekê wan bavikan eşîreke serbixwe dibîne.

Di hin çavkaniyên biyanî de jî Eşîra Pencînarê wek heft eşîr hatine xuyakirin û peyva pencînarê herwekî nav be bo hemiyan.

Çewa ku nivîskara Swêdî Barbroyê di pirtûka xwe ya bi navê “Oster Om Eufrat” (Rojhilata Firatî) de nivîsiye û nexşeyek jî tê de bi cih kiriye, bi sedan navê eşîrên Kurdistanê nivîsiye, herweha navê eşîra PENCINARê jî di nexşeyê de wek eşîreke sereke daye xuyakirin û her heft bavikên wê jî, wek eşîrên girêdayê pê ve daye nasandin.
Heft bavikên Eşîra Pencînarê ev in:

Bavikê Kejikan
Bavikê Kurdikan
Bavikê Mala Faro
Bavikê Mala Şemdîn
Bavikê Miradan
Bavikê Mûsikan
Bavikê Weliyan

Peyrewên Eşîra Pencînarê bisilmanên Sunî û ji rêçika Şafiî ne. Lê sê gundên wan hene ku Ezdayî ne.

Du eşîrên dî jî hene ku Eşîra Pencînarê, wan wek pismamê xwe dibîne, yek Eşîra Siloqan û ya din Eşîra Elikî e.

Rîspiyên eşîran dibêjin ku pêşiyê wan sê bira bûne: Yek bi navê Penco, yek bi navê Silo û yek bi navê Elo bûye.

**4. Sîstema îdareya Eşîra Pencînarê:**

Meclisek bi navê Meclisa Bala, ya Eşîra Pencînarê hebûye. Ji her bavikekî eşîrê, kesek an du kes endamên meclisê bûne. Ew kes, kesên wisa bûne ku di nava bavikê xwe de pêbawr, dirust, rastgo û mirovperwer bûne. Bi biryara bavêkan ew kes diçûn Civata Bala ya eşîrê. Serokê eşîrê ku bi navê axa hatibû binavkirin jî, çi biryareke ku bida, erêkirina nûnerê endamên meclisê werdigirint û hêj ew biryar ji eşîrê re dibû wek yasa.

Endamên meclisa bala ya eşîrê, kinceke wan a taybetî bi navê EBA hebû, hertim li xwe dikirin. Îcar ew dema li derva digeriyan û ku ew eba li wan bûya, her kesî dizanibû ku ew endamên meclisê ye û rêzmendiya xwe jê re werdigirtin.

**5. Serokatiya Eşîra Pencînarê:**

Li gor lêkolînan û gotina rîspiyên Eşîra Pencînarê, ev e 250 sal in serokatiya Eşîrê di destê **Mala Faro** de bûye. Herweha ji vê malbatê gelek peya û mêrxasên mezin derketine û dilqekî mezin dane leyîztandin.

Diyar bûye ku di Mala Faro de heta deh bavan jî, tev bi destên leşkerên Împeretoriya Osmanî, hinek jî bi destên leşkerên Komara Tirkiyê hatine kuştîn. Gora gelek ji wan mêrxasan hêjî ne diyar e.

6- Şerê Eşîra Pencînarê bi Împereroriya Osmanî re:

Di Sedsala 18 û ya 19an de Eşîra Pencînarê, sê şer bi Împeretoriya Osmanî re kirine. Di şerê pêşî de eşîr bindest bûye û hemû gundên wê şewitandine. Lê di şerê duyem de Osmanî bindest bûne û bêgav mane bi eşîrê re peymana aştiyê çêkirine. Hetanî 1924an jî leşkerên Osmanî (Komara Tirkiyê) nediketin nava aqarê Eşîra Pencînarê ku sînorên nexşeya wê, dema di peymanê de hatibû kifşkirin.

Dema **Qasimê Ozman** serokê Eşîra Pencînaran bûye, herêma Xerzanê mîrektiyeke serbixwe û girêdayê bi Împeretoriya Osmanî ve bû. Li bajarê Zoqê **Mîrê Kal,** mîrektiya herêmê dikir. Wê demê şerekî xwîndar li **Karmelîh**a Sasonê di navbera eşîrên Kurd û leşkerên Osmanî de çêbûye û gelek leşkerên Osmanî hatine kuştin. Padîşahê Osmanî gotiye: "Eger Mîrê Kal çavên xwe ji eşîrên Kurd re negirtiba, zora me biribûna."

Împeretoriya Osmanî Mîrê Kal vexwendiye Stenbolê û li wirê dest danîne serê. Di şûna wî de serbazek bi navê **Ebdurehman Paşa** bi payeya Musellim hinartine **Keleha Zoqê** û wek Mîrê Xerzanê dest bi kar kiriye.

Ebdurehman Paşa demildest eşîrên herêmê (**Babosî, Pencînarî, Siloqî, Elikî)** xeberdar kiriye ku ew muselim e û mezinê herêma Xerzanê ye.

Qasimê Ozman ê mezinê Eşîra Pencînarê, xeber hinartiye pey **Purto**yê mezinê Eşîra Elikan, **Xalid**ê Hamid ê mezinê Eşîra Babosiyan û **Silê**yê mezinê Eşîra Siloqan, da werin koçka wî. Piştî hatina wan serokeşîran, Qasimê Ozman gotiye wan**:** "Eger hûn tev bi min re bibin yek, ez hikmê vî Muselimê Osmanî li ser xwe qebûl nakim. Em ê herin bêjin wî: Divê tu ji virê herî û Mîrê Kal were cihê xwe. Eger daxwaza me bi cih anî ji xwe baş e, eger na, em ê wî bikujin."

Ew her sê serokeşîr bi Qasimê Ozman re bûne yek, tevî 100 şervanên siwarî yên Pencînarî çûne bajarê Zoqê. Qasimê Ozman gotiye şervanên xwe: Gava min destê xwe avêt simbêlê xwe û bada, hûn lêxin û Muselimê Osmanî bikujin.

Her çar serokeşîr gava çûne ba Muselim Ebdurehman Paşa, Qasimê Ozman gotiye wî: Em mezinatiya te li ser xwe qebûl nakin, divê tu rabî herî Stenbolê û Mîrê Kal dîsa were şûna xwe.

Muselim Ebdurehman Paşa li ser wê gotina Qasimê Ozman, pir xeyidiye û xeberên giran gotiye. Qasimê Ozman jî dest avêtiye aliyekî simbêlê xwe û badaye, şervanên wî Muselim Ebdurehman Paşa tevî 12 leşkerên wî kuştine.

Piştî kuştina Muselimê Osmanî, Împeretoriya Osmanî fermana kuştina Qasimê Ozman daye û di 1838an de 10 hezar leşker bi serokatiya **Topal Ebas Paşa** hinartine ser eşîra Pencînarê. Li Deşta Mêlihayê şer sê sal domandiye û di 1841ê de Osmanî bindest bûne, piştre peymaneke aştiyê bi Eşîra Pencînaran re çêkirine, û Osmanî ji herêma Xerzanê vekişiyane, hetanî 1924an jî leşker nediketin herêma Xerzanê.

Li ser wî şerî straneke folklorî jî heye:

…
Qasim Axa tevlî sed siwarî hicûmê ser Zoqê kir
Kete daîra Ebdurehman Paşa,
serê Ebdurehman Paşa û dozde mufetişan jê kir…
…

Berî Serhildana Bedirxaniyan (1835), piraniya serokeşîr û xûyaniyên Kurdistanê civînek li **Pira Samanê** kirine û biryar dane ku wê li pêşberê Osmaniyan dest bi Şerê Azadiyê bikin. Wê hingê berpirsyariya ku dane **Çetoyê Îskan ê** serokê Eşîra Pencînarê ev bû ku ew dê xetên telefonê yên di navbera Diyarbekir û Sêrtê de biqetîne û bibe asteng da hêza Osmanî ya pêşikvan nekeve nêv herêma Xerzanê.

Gava Şerê Serhildanê dest pê kiriye, artêşa Osmanî di wê demê de du car çûye herêma Xerzan. Lê herdû caran jî, ji aliyê şervanên Çetoyê Îskan ve hatine şikandin. Lê belê cara sisiyan ku hêzeke leşkerî ya zêde çûye herêmê, Çetoyê Îskan dîl ketiye destên Osmaniyan û wî hinartine girtîgeha Girîdê.

**Çetoyê Îskan** dema ji Girtîgeha Girîdê hatiye berdan, dîsa li Eynqesrê şer bi leşkerên Osmanî re kiriye. Çendî ku agahdariyeke zêde li ser wî şerî bi dest neketiye, lê Çetoyê Îskan dîsanê wek dîl ketiye destên Osmaniyan û wî birine girtîgeha Gêncê.

**7- Avakirina Hikûmeteke Kurdî:**

JI ALIYÊ CEMÎLÊ ÇETO VE Piştî ku serokê Eşîra Pencînarê Bişarê Çeto li Ormiyê di şerê li pêşerê Rûsên Çar de şehît bûye (1914) û birayê wî yê piçûk Cemîlê Çeto bûye serokê eşîrê, Cemîl jî gelek çalakiyên hêja li pêşberê Osmaniyan kirine.

Li gor pirtûka bi navê *Serhildana Kurdan*, Şerîf Paşa li Parîsê li ser navê rêxistina *Kurt Teavun ve Terakîyê* diyar kiriye û gotiye**:** Bila Kurd hikûmeteke kurdî ava bikin. Li ser wê xeberê, Cemîlê Çeto digel hin eşîrên din yên herêma Xerzanê di 1920î de dest bi avakirina hikûmeteke kurdî kirine. Di eynî demê de Kurdên Qoçgîriyê jî dest bi avakirina hikûmeteke kurdî kirine.

**8. Xeniqandina Cemîlê Çeto:**

Piştî rûxandina Serhildana 1925an a bi serokatiya Şêx Seîd, Dadgeha Îstiqlalê ya li Diyarbekirê biryara xeniqandina 460 Kurdên xuyanî daye. Serokê Eşîra Pencînaran Cemîlê Çeto jî yek ji wan bûye ku hatiye xeniqandin.

**ÇAVKANÎ:**

Barbiro Karabûdak "Oster Om Eufrat" - Rojhilata -Çemê- Firat), Tidens Förlags Tryckeri AB, Sweden/Stockholm 1960.
Şerê Sasûnê (1925-1937) Osman Sebrî, Weşanên Pêrî, 2005, Stenbol, rûpel 15.
Pirtûka KURT ISYANLARI, rûpel 33
Jīnewariya Derwêşê Sado, Zeynelabidīn Zinar,
kurdī/lêkolīn, Sverige/Stockholm, 2010, 220 rūpe, ISBN 91 89491 84 X).
Hemdīn ū Şemdīn, Zeynelabidīn Zinar, kurdī/folklor - serpźhatī, Pencīnar
Weşanxaneya Ēanda Kurdī, Sverige/Stockholm, 1998, 112 rūpel, ISBN 91 972779 75)
Nameya ATATÛRK ji Cemîlê Çeto re, NUTUK cild III, sayfa 944-945, Vesika 53.
13.8.1919. KURT ISYANLARI, Cem Yayin Evi, Istanbul 1991.
PENCINAR Weşanxaneya Çanda Kurdî – STOCKHOLM

## Kürt devlet ve beylikleri sisteminde aşiretler Pencinara Aşiretin, örneğin

**Özet**:

10-12 devlet ve birçok Kürdistan Mirasının, birçok Kürt ve yabancı aydın tarafından ve ayrıca bilim kurumları tarafından iyi bilindiği ve bunlar hakkında birçok çalışma yapıldığı açıktır.

Ancak Kürdistan Aşiretler sistemi bugüne kadar bilinmediği gibi bilinmesi yönünde de bir talepte bulunulmamıştır. Nedense kabilelerin gücü gizli kalmış ve yaşamları/tecrübeleri araştırma konusu olmamıştır.

1995-96'da Zozan Şerafdin Beyliği ve ardından 2005-06'da Pençinar Aşireti üzerine detaylı bir çalışma yaptığımızda Kürdistan Aşiret Sisteminin yanı sıra Kürdistan Devlet ve Beylikler Sisteminin de sürdürüldüğünü ortaya koydu.

Kürdistan'ın çoğu aşiretinin liderliğinde, AXA adında bir lider olmasına rağmen, bir aşiret meclisi de vardı ve aşiretin her patriğinin veya ana aşiretle bağlantılı her aşiretin mecliste bir temsilcisi vardı. Kabile denetiminde mahkemeler, hapishaneler, sürgünler kullanılmış ama cinayet işlenmemiştir.

Çünkü Kürdistan aşiretleri kültürlerini Kürdistan Beyliklerinden almıştır.

Kürdistan beylikleri de kültürlerini Kürt devletlerinden almıştır.

Kürt İlim Kurumlarının Kürdistan Aşiretlerinin otoritesi konusunda detaylı bir çalışma yapması nedense çok önemli.

. Kürdistan'da devlet sistemi olarak otoritesini koruyan aşiretlerden biri de araştırma kitabımızda doğru bir şekilde anlatılan Pençinar aşiretidir.

. İkincisi ise yine tarafımızdan kitap olarak yayınlanmış olan Zozan Şerafdin Kabilelerinin deşelatıdır.

. Üçüncüsü, Osman Sabri'nin hakkında yazdığı Sason boylarıdır.

. Ayrıca Kürdistan aşiretlerinin çoğu da bu devlet sistemiyle yaşamlarını sürdürmüştür.

18.-19. yüzyılda Pençinar aşireti Osmanlı Devleti ile iki kez savaştı.

Birinci savaşta aşiret boyun eğdirildi, ancak ikinci savaşta Osmanlılar kayıtsız kaldı ve onlarla barış anlaşması yaptı.1924 yılına kadar Osmanlı askerleri (Türkiye Cumhuriyeti), haritası olan aşiretin topraklarına girmedi. sınırlar anlaşma sırasında keşfedildi.

Zozan Sherafdin'in yönetimi 17. yüzyılda kuruldu.

18-19. Yüzyıl ve 20. Yüzyılın ortalarında meydana gelen Kürt uluslarının tüm ayaklanmalarının kesin olduğu açıktır. Tüm bu isyanları Kürdistan aşiretleri organize etti. Bu nedenledir ki işgalci devletler Kürdistan ağalarını, şeyhlerini hep boğmuştur.

**ANAHTAR KELİMELER**: *Pencinar, Bishar Çet, Hüseyin Axa, Savaş, Mêliha, Sason, Hekariya Aşiretleri.*

**Tribes in the system of Kurdish states and principalities the Pencinar tribe For model**

**Abstract**:

It is clear that 10-12 states and many Kurdistan Heritages are well known by many Kurdish and foreign intellectuals, as well as by scientific institutions, and many studies have been done on them.

However, the Kurdistan Tribes system has not been known until now, and there has been no request to be known. For some reason, the power of the tribes has remained hidden and their lives/experiences have not been the subjects of research.

In 1995-96, when we conducted a detailed study on the Principality of Zozan Şerafdin and then in 2005-06 on the Pencinar Tribe, it was revealed that the Kurdistan Tribal System has been maintained as well as the Kurdistan State and Principality System.

In the leadership of most tribes of Kurdistan, even though there was a leader named AXA, there was also a tribal assembly and each patriarch of the tribe, or from each tribe that was connected to the main tribe, had a representative in the assembly. Under the supervision of the tribe, courts, prisons, and exile have been used, but there has been no murder.

Because the tribes of Kurdistan have received their culture from the Principalities of Kurdistan.

The principalities of Kurdistan also received their culture from the Kurdish states.

For some reason, it is very important that the Kurdish Science Institutions do a detailed study on the authority of the Kurdistan Tribes.

. One of the tribes of Kurdistan that has maintained its authority as a state system is the Pencinar tribe, which is properly described in a book of our research.

. The second is the deshelat of the Tribes of Zozan Sherafdin, which has also been published by us as a book.

. The third one is the Sason tribes that Osman Sabri wrote about.

. In addition, most of the Kurdistan tribes continued their lives with that state system.

In the 18th-19th century, the Pencinar tribe fought twice with the Ottoman Empire.

In the first war, the tribe was subdued, but in the second war, the Ottomans remained unmoved and made a peace agreement with them. Until 1924, the Ottoman soldiers (Republic of Turkey) did not enter the territory of the tribe, whose map boundaries were discovered at the time of the agreement.

Zozan Sherafdin's administration was established in the 17th century.

It is certainly clear that all the uprisings of the Kurdish nations that occurred in the 18th-19th century and the middle of the 20th century. All those riots were organized by the Kurdistan tribes. It is for this reason that the occupying states have always strangled the lords and sheikhs of Kurdistan.

**KEY WORDS**: *Pencinar, Bishar Chet, Huseyn Axa, War, Mêliha, Sason, Hekariya Tribes.*